

BAYKOT, ERKEKE NÎŞTIMANÎ YE

► Di 12'ê Hezîrana 2009'an de, şanogeriya hîlbijartinên Serok Komariya rejîma Îslamî birêve diçe. Di hemû hîlbijartinên ku piştî şoreşa neteweyên Îranê ya sala 1979'an de hetine organîzekirin, esl û mercên herî serekî û destpêkî ên hîlbijartinên azad û demokratîk nehatine parastin. Rejîma Komara Îslamî ji hîlbijartinan weke alavekê tenê bona nîşandana rewatiya rûyekî a xwe mifahê distîne û bi wan şanogeriyan dixwaze raya giştî bixapîne.

Li bajarên Kurdistanê Îranê bazara vê gerra şanogeriya hîlbijartinên rejîma Komara Îslamî sar e û çavnehêrî tê kirin weke carên berê kurd bi kêmi beşdarî hîlbijartinan bibin.

Baykut û beşdarînekirin di dehemîn gerra hîlbijartinên Serok Komariya rejîma Îslamî a Îranê erkeke nîştimanî



ye. Nivîs û hevpeyîna taybet li ser rojeva hîlbijartinan di vê hejmara Agirî de bixwînin...

Kerîm Perwîzî, endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ di hevpeyvîneke taybet de ji bo Agirî, li ser rojeva hîlbijartinên gerra dehem a Serok Komariya Îranê dipeyive:

“Serokên rejîma Komara Îslamî bi hûr û girên wan bas ji vê yekê kirine ku bingeh ji wan re parastina rejîmê ye û bona parastina rejîmê jî hewce ye ku herî zêde xelk di hîlbijartinan de beşdariyê bikin, êdî ji kî re deng didin, ne girînge”

Hevpeyvîn di R. 2 – 3'an de



**Bi zikê birçî,
didanan disû**

4




**Xeteriyên
Tundûtûjiya
Pêkhatayî ...**

7



**Şaristaniya
Hemdem**

9



Kerîm Perwîzî, endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ di hevpeyvîneke taybet de ji bo Agirî, li ser rojeva hîlbijartinên gerra dehem a Serok Komariya Îranê dipeyive:

“REJÎMA WILAYETA FEQÎH TU FÎRSEND Û DERFETEKÊ BONA GUHARTINAN NADE, TENÊ DERFETA DORANDINÊ

Roja îne, 12'ê Hezîrana 2009'an, dehemîn gerra şanogeriyan hîlbijartinên Serok Komariya Îranê dê birêve biçin. Ji bo bas û nîqaş li ser rojeva hîlbijartinên vê gerrê û haydarbûn ji helwest û siyasetên PDKÎ û partiyên din ên Kurdistanê derbarê hîlbijartinên rejîma Komara Îslamî, me hevpeyvînek taybet bi Kerîm Perwîzî, endamê Deftera Siyasî a PDKÎ re pêk anî. Eva jêr deqa wê hevpeyvîne ye:

Hevpeyvîn: Azad Kurdi

Nirxandina we li ser rewş û rojeva dehemîn gerra hîlbijartinên Serok Komariya

Îranê çawa ye?

Kerîm P: Berî her tiştî divêt wê yekê bibêjim, ewa ku di bin desthilatdariya rejîma Wilayeta Feqîh a Îranê de tê meşandin, ne hîlbijartin e, belkî şanogeriya bi navê hîlbijartinê ye ku hemû pîvan û normên demokratîk ên hîlbijartinê jê hatiye standin û naveroka wan hatiye vala û betalkirin û bi formeke berevejî hîlbijartinan birêve diçe ku ewê/a li Îranê jiyabe û ji nêzik ve bûyerên siyasî ên Îranê mêze dike, dizane ku tiştêk bi navê hîlbijartinê nahê meşandin.

Ev dewre ji şanogeriya hîlbijartinê di Komara Îslamî de di rewşeka taybetî a wê rejîmê de tê rêvebirin û pirr dişibe gerrên berê û hindêk jî cudahiyan hûr û biçûk hene. Li ser rewşa taybetî a birêveçûna wê dewreya bi nav hîlbijartinan de, hewce dike em bi kurtî qala rewşa siyasî a hundir û derveyî Îranê bikin. Di asta derve û siyaseta rejîmê tevî welatên derdor û cîhanê de, wek hemû dizanin, rejîma Îslamî a Îranê bi tevahî di berxwedaneke siyasî bi pirraniya welatên herêmê û herwiha welatên Rojavayî de ye û li ser du pirsên girîng ên terorîzm û çeka tevkuj, rejîma Komara Îslamî yê ketiye berxwedaneke çarenivîssaz û di asta welatên deverê de jî, bi piştgirîkirina eşkere ji girûpên tundajo û maytêkirinên xwe yê nerewa, fitne û ajawe di navçeyê de çêkiriye û herî zêde weke rejîmeke serberedayî û bi xeter tê naskirin.

Di asta siyaseta hundirê welat de jî, her çiqas dem dibihure, rejîm zêdetir tevî kirîzên aborî, siyasî û civakî berbirû dibe û hemû ew qeyranên ku bi xwe çavkanî û sedemê sereke yê serhildana wan e, berçêla civaka Îranê girtine û pirsgirêk û giriftên zaf ji bo rejîma Komara Îslamî pêk anîne û civaka Îranê bi hemû çîn û qatan û tev neteweyên zilmjêkirî li Îranê, ji wê rejîmê nerazî ne û heta diçe xebat a tex û qatên cuda cuda û netewên kedlêxwarî ên Îranê xurt dibe û rejîm jî serkut û qirkirinê zêdetir dike.

Di rewşeka wisa de, rejîma Komara Îslamî van binav hîlbijartinan rêve dibe, hîlbijartinek ku gellek dişibe şanogeriyan berê, bi wê ferq û cudahiye ku di fênd û fêl

û şanogeriyan xwe de hinek guhartin kirine û bona tevlihevîkirina dengê xelkê û rakêşandina wan bo ser sindoqên dengdanê bona rewayî û berheqîdan bi Komara Îslamî, hindêk propagandayên savilke û xapîner bi kar anîne. Cudahiya din a wê gerrê sarbûn û guhnedana xelkê bi propagandayên rejîmê û berbîjarên wê ye û hezkirinek wisa xuya bona beşdarîkirin di wan şanogeriyan de tune ye, lewra pêşdîtin tê kirin, şanogeriya rejîma Komara Îslamî di wê dewreyê de, ji aliyê xelkê ve pirr kêmtir ji carên berê bal û guh pê bihête dan û hejmareke kêmtir di roja dengdanê de li ser sindoqên dengdanê de amade bibin.

• Gellek bas ji nedemokratîkbûna hîlbijartinan û neguncana hîlbijartinan di sistema Komara Îslamî de tevî pîvanên demokratîk tê kirin, li gora kîjan pîvan û mercan, ev hîlbijartinane nedemokratîk in?



Kerîm P: Hîlbijartinên demokratîk xwediyê hinek bîngihan in û divêt xwediyê çendin taybetmendiyên jî bin heta ku hemû prosesa hîlbijartinê weke diyardeyeke demokratîk derkeve rojevê û vîn û îradeya azad a xelkê nîşan bide.

Hîlbijartinek demokratîk berî her tiştî hewceyî bi zemîneyek siyasî – civakî a demokratîk heye. zemîneya siyasî a demokratîk bi wê wateyê ku siyasêtkirin û beşdarîkirin di siyaseta de demokratîk be. Bona wê demokratîkbûnê jî pêwîst e ku hemû takekesan di nava civakê de azadiya siyasî hebin û xwediyê mafê siyasî yê wek hev bin û ji bo piraktîka siyasî, xwediyê alavên hewce yê weke partiyên azad û demokratîk, ragehandina azad, sendîka û rêxistinên sîvil û wd... bin, heta ku bikarin ji rêya wan alavan ve xwestek û daxwazên

xwe bêtir sansor û tirsê bînin rojevê û bixin ser hev û berhevbûna çand partiyên xwedî pêgeh û nîfûz ên xelkî, weke komdengiya takekesên azad derdikeve holê.

Bestêna civakî jî bi wê manayê ye ku takên civakê bikarin û derfeta beşdarîkirin wekhev û serbest di jiyana civakî û aborî de hebin û bi piştevaniya hevta a aborî û civakî bikarin di proseyan siyasî de beşdar bibin û bestêna civakî a demokratîk rêyê ji cudahîdan û tevlihevî di prosesên siyasî de bigre.

Dema ku em wan tiştane digel rewşa Îranê û Komara Îslamî dinirxînin, cudahiyan zaf ji em re derdikevin holê, ji nebûna azadiyan takekesî û azadiya raderbîrîn û gotinê bigre heta serbestbûna partiyên rasteqîne ên azad heta digihîje îman û derfeta pere û aborî a berfireh li ber destê berbîjarên rejîmê û heta digihîje derew û fênd û fêlbazî û soz û qewlên derewîn ji aliyê berendamên cur bi cur tîndarî. Soz û peymanên derewîn di wê rejîmê de wisa jê hatiye ku tevlihevîkirin û derewkirin yê bûye kultûreke siyasî û xelk bi wê yekê elimîne ku her carê di her binav hîlbijartinekê de derew û virrên zaf û yê nû ji berendamên rejîmê bibihîzin.

Cuda ji bestêna siyasî – civakî, proseya hîlbijartinan di Komara Îslamî de tevî pîvanên demokratîk li hev nahê. Her di yekem pêngava xweberbîjarkirina kesekê ji bo Serok Komariyê li gor qanûna rejîmê, beşa herî zêde a xelkê û neteweyên Îranê ji mafê xweberendamkirinê bêpar dibin, ji ber ku li gora qanûnê wê rejîmê tenê xwediyê Ola Şîa a donzdeh Îmamî yê bawermend bi Wilayeta Feqîh ew jî li cura wê ya “mutleq” (reha) mafê xweberbîjarkirinê heye ku ev cure kesane di Îranê de pirr kêmtir in û di nava wan de jî kesaneke ji filtera Konseya Parêzvan re derbaz dibin ku pêbendbûna xwe ya bi piraktîk û kiryar ji bo Weliyê Feqîh û rejîma wî selimdibin û di nava wan cure kesane de jî ku ew taybetmendî wan bi xwe ve digire, divêt berî hemû tiştêkê dilê Weliyê Feqîh bidest xistibe heta bikarin xwe berendam bikin, di vir de ye ku henekbûna hîlbijartinan di rejîma Komara Îslamî de derdikeve holê.

Li gora van tiştên ku me bas kirin, di rastî de rejîma Komara Îslamî ji xelkê re dibêje, we hîzr û tîgihîştina wê yekê çî nine ku hûn bi xwe Serok Komar ji xwe re hîlbijêrin, em dê di nava dar û destekên xwe de, çend kesan destîşan bikin û em dê ji we re bibêjin ku deng bi ji kîjanî re bidin çêtir e!

Komedîbûna hîlbijartinên wê rejîmê bi soz û qirarên derewîn yê berendamnan dom dike û di dawiyê de jî, rejîmê kî pê baş be li sindoqên dengdanê derdixe û dibêje eva hîlbijartiyê xelkê ye! Ne aliyekî bêtagir heye ku çavdêriyê bi ser hîlbijartinan bike! Ne ewa ku heta guh bidin gazinde û

şikayetên mohreyên xwe jî. Di gerra borî de me dît ku Refsencanî ku bi xwe yek ji kolekeyên rejîma Komara Îslamî tê binavkirin, ew qas ji wê şanogeriye komedî bêzar bû û digot ku di dengdanê de destwerdan hatiye kirin ku şikayet û gazindeyên xwe birin cem Xwedê!

• **PKDÎ û KOMELE di daxuyaniyeke hevbeş de ev gerra hilbijartinan baykut kirin, çima baykut?**

Kerîm P: Her wek min berê qal kir, hilbijartineke azad û rasteqîne di Îranê de birêve naçe. Lê du tiştên giring hene ku divêt em bi wan zêde bikin. Yekem eva ku di sistema Komara Îslamî de li gora yasa û îdeolojiya rejîma desthilatdar, Welîyê Feqîh desthilata reha û bêsinor heye û li serweyî tev qanûnan e. Bepirsê hemû hêzên leşkerî ye, diyarîkirina siyaseta stratejîk û siyaseta derve û diyarîkirina berpirsiyarê ragihandin û Rêxistina Deng û Reng a wê rejîmê û diyarîkirina siyaseta aborî û diyarîkirina berpirsên dezgeha dadê û endamên Şêwra Nobedar û Civata Diyarîkirina Berjewendiyên nîzame û berpirsê Civata Şoreşa Çandî û wd... li sûyê wî ye. Bi kurtî, di Îranê de hemû desthilat di bin çengên Welîyê Feqîh de ye û Serok Komar di sistemeke wisa de tenê divêt birêveberê fermanên Welîyê Feqîh be. Her weke di serdemê senaryoya reformxwazên rejîma Komara Îslamî de jî Xatemiî îtiraf bi vê yekê kir ku Serok Komar tenê tedarukatçî ye û tu tiştek din nine. Di sistemeke wisa de ku hilbijartinên derewîn jî tê de tîn meşandin, ez bawer im her kesekî azadîxwaz, biwêr û negirêdayî bi rejîmê û nexapandî, dê vê şanogeriye baykut bikin û henekan bi viyan û aqilê xwe nakin.

Tiştê duyê ku di vê gerra hilbijartinan de berçav e, berendam bi xwe ne. Çar kesên berbijarkirî ên rejîma Îslamî a Îranê ji bo posta Serok Komariyê, heke em ji bangeşê û propagandayên derewîn ên wan bigerin û perde li ser virr û derewên wan hil bidin, cudahiyeke wilo di navbera wan de nahê xuyakirin û em vîn û îradeyê di wan de nabînin ku rêzê ji bo dengê xelkê danên. Ew her çar kes ji mohreyên herî xweyî û ên di nava dezgeha Wilayeta Feqîh de ne. Nemaze li hember neteweyên bindest, ji birêveberên talan û tawanan bûne û derbazbûyî û karnameyêke pîrr reş û dijî gelî hene.

• **Çend kes û aliyên kurd li Kurdistana Îranê, bangeşeyê ji bo beşdarîkirin di hilbijartinan û piştgirî ji berendamên wê gerrê dikin. Gelo ev helweste bi zirar yan bi qazancê tevgera rizgarîxwazî û demokrasîxwaziya Kurd di Rojhilatê Kurdistanê de ye?**

Kerîm P: Ewa ku em niha di qada siyaseta Kurdistana Rojhilat de dibînin ku çendîna kesayetî û çend aliyên Kurdî ku her parek ji wan piştevaniyê ji beşek ji berendamên rejîmê dikin, tiştek nû di azmûna xebatê di Kurdistana Îranê de nine. Niha em mêze dikin kesaneke piştgiriyê ji

Ehmedînejad dikin, kesaneke jî piştgiriyê ji Mûsewî dikin yan kesaneke din piştevaniya xwe ji Kerûbî xuya kirine, eva tiştek dubarekirî a salên borî ên xebat li dijî Komara Îslamî ye û her carê bi awayekê xwe derdixe holê, lê renga ew kes nehên guhartin.

Di heyamê 30 sal ji hatne serkarê rejîma Komara Îslamî û xebat û berxwedana neteweya Kurd de, tiştên cur bi cur hatine ceribandî û di her qonaxekê de tevgera azadîxwaz û neteweyî tevî rûweke nû û liv û tevgerê cuda berbirû bûye. Di destpêka desthilatdariya rejîma Komara Îslamî de ku Xumeynî fermana Cîhadê li dijî Kurd îlan kir û neteweya Kurd jî berxwedaneke bêminak û pîrr şan û şeref meşand, kes û aliyên wisa peyda bûn ku bizava neteweyî – demokratîk a Kurd bi şerxwaziye tawanbar dikirin û degotîna divê Kurd biçe hembêza Komara Îslamî!! Pasdarên rejîmê jî bi top û tankan gund û bajarên Kurdistanê kavi û wêran dikirin û wan kesan jî bi gotin û siyasatên xwe yê şaş dixwastin refên xebata gel tevlihev bikin, dîrokê nişan da ki serbilind e û kî jî bi xirabî nav tê birin.

Di salên dawîya wê de jî Kurd û Kurdistan li ser pêyan û bi serbilindî sekinî û kesaneke ku ji hêla Komara Îslamî hatibûn xapandin, tevî refên xebatê bûn, di refa xebatê de jî

Kerîm Perwîzî:

“Di Îranê de hemû desthilat di bin çengên Welîyê Feqîh de ye û Serok Komar di sistemeke wisa de tenê divêt birêveberê fermanên Welîyê Feqîh be”

kesên wilo jî peyda bûn ku bi dijmin dihatin xapandin yan kes û aliyek wiha peyda dibû ku li xebat û dijjariyên wê mandî dibû û li pey hêcetê bona vehevîyan di bin sîbera Komara Îslamî de digeran.

Niha jî rejîma Komara Îslamî her heman rejîm e, tenê ewa ye ku hov û dîrendîtiya wê zêdetir bûye û propaganda û şeklên wê yê xapandinên hinek guhertiye. Nexa ne sistema Komara Îslamî guheriye, ne keys û derfeta guhartinê dide, ne hêzek di nav dilê Komara Îslamî de perwerde bûye ku li dijî wê rejîmê lê helbigere, ne jî hêviyek bona çaksaziyan di nava rejîma Wilayeta Feqîh de tê dîtin. Serokên rejîma Komara Îslamî bi hûr û girên wan bas ji vê yekê kirine ku bîgeh ji wan re parastina rejîmê ye û bona parastina rejîmê jî hewce ye ku herî zêde xelk di hilbijartinan de beşdariyê bikin, êdî jî kî re deng didin, ne girînge.

Ji bo rejîma Îslamî a Îranê girîng beşdarîkirina xelkê û aliyan di wê şanogeriye de ye, heta ku xwe bi rejîmeke xwedî rewatî û pêgeh û xelkî nişan bidin û aliyên dîrketî ji rejîmê jî ber bi aliyê rejîmê rakêşineve û bi sere talîkekê, wan bi çarenivîsa rejîma xwe ve girê bidin.

Nexa hemû dizanin û li gora ceribîna 30 saliya rejîmê yê derketiye holê ku tev derewên serdemê şanogeriya hilbijartinan

tenê xapandin in, ne çî tiştek din û rejîmê û berendam û mohreyên wê di derewkirin û fêlbazî û xapandinan de destek bilind û bêminak hene. Propagandaya hin kes û aliyên Kurdî ji bo her yek ji berbijarên rejîma Komara Îslamî ku hemû her mohreyên giring ên wê rejîmê ji bo tawan, kuştin û talankirinê bûn, tu qazancek ji bo Kurd û xebata rewa û berheq a Kurd tê de nine û ewa ku ew kesane yan bi zanebûn û bi nezanebûn dikin, diçe xizmet bi berjewendiyên rejîmê bona têkdana refa xebata yekhelwestiya Kurd li hember rejîma serberedayî a Komara Îslamî û dizanin ku rejîma Wilayeta Feqîh tu firsend û derfetekê bona guhartin nade, tenê derfeta dorandinê dide.

• **Bi berçavgirtina sefera vê dawiyê a rêberê olî yê rejîmê ji bo parêzgeha Kurdistanê û piştî jî bi anîne berbasa mafê kêmaniyên olî û bi gotin wan mafê “eqwam” an ji aliyê Kerûbî û heta qasekê ji Mûsewî û her wiha ji ber hebûna rewşa serkutkirinê, gelo xelkê Kurd dê weke caran, hilbijartinên vê carê jî baykut bike?**

Kerîm P: Di vê derbarê de çar xalên hene ku divêt em wan li berçav bigirin:

Yekem: Xamineyî di serdana xwe de ji bo Kurdistanê, serbarê wê çendê ku xelkê bi darê zorê û gef û hereşeyan li vir û wir bona pêşwazîkirin ji wî anîbûn, di axavtina xwe de li Kurdistanê tenê bas ji pirsgerêka olî û dînî kir û bi fêlbazane xwest hem xwe ji pîrsa neteweyî li Kurdistanê vedize xwe lê baz bide, hem pirsgerêka olî bixwe nav refa xelkê Kurd ku him kurdên Sunî heye û him Şîe. Ji aliyekî din ve jî, di axavtina xwe de bêhurmetî bi bizava neteweyî – demokratîk a Kurd kir ku ew hinde din rejîm li ber çavê xelkê reş kir.

Duyem: hemû neteweya Kurd, bi tev çî û qatên wê ve, ji bilî hinek kesên xapandî û mandîbûyî nebe, dizanin ku gotinên Kerûbî û Mûsewî propagandaya derewîn ji bo serdemê hilbijartinê ne û heke ew bibin Serok Komar ger bi vîn û îradeyê ecêb jî bixwazin ew derewên ku gotine, bicî bînin, desthilat tu nabin û heke em bi kurtî bibêjin, di dawiyê de dê bi hukmê hikûmetî wan bêdeng bikin.

Sêyem: serkut, tundûtûjî û çavzilkirin û gefxwarin û talan û tawan, salaneke dîr û dirêj e li hember neteweya Kurd birêve diçe û neteweya Kurd bi van tiştane natirse.

Çarem: ew kesên ku ji bo beşdarîkirin di şanogeriya rejîma Komara Îslamî de propagandayê dikin, li hember refa yekgirtî a gel gellek kê û biçûk in û tenê xwe û çend kesên biçûk ên derdora wan dê pê bihên xapandin û bandoreke wisa di civakê de tuninin.

Bi serhevistina van çar xalên ku min bas kir, bi erxayînî ve xelkê Kurd dê bi awayekî berfireh û berçav hilbijartinên Serok Komariya rejîma Îslamî a Îranê baykut bikin û ne tenê di asta Kurdistanê de, belkû li seranserê Îranê, xelk dê pîrr kê di vê gerra hilbijartinan de beşdar bibe û refa neyarên rejîmê xurt û bihêztir dibe û dê zivistan jî bi dawî were...

RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

Ebdullah Hicab



Bi zikê birçî, didanan disû

Bi teqandina vê carê ya navikî û ceribandîna li pey hev yê roketan re, Koreya Bakûr, dubare xwe xiste

ber rexneyên tûj yê navneteweyî û metirsiya dorpeçkirinê abûrî û siyasî. Vê carê Koreyê êdî cihan ji şik ne şikê derxist û selimand ku xwediyê hêza navikî ye. Koreya Bakûr li pey Dewletên Yekgirtî yê Amerîka (1945), Yekîtiya Sovyet a berê (1948), Bîrtaniya Mezîna (1952), Fransa (1960), Çîn (1964), Hindistan (1974) û Pakistan (1999), welatê 8'ê ye ku bi awayê fermî radigihîne ku xwediyê çekên navikî ye. Li kêleka wan welatan, tê texmînkirin ku Îsraîlê jî ev çek hebin. Welatên mîna Almanya, Îtalya û gellek welatên din teknolojiya berhevanîna wan şêwe çekan bi amadeyî hene. Hevdem Îran û hin welatên din hewl didin teknolojiya pêwîst ji bo berhevanîna çekên navikî bi dest bixin.

Stratêjiya xwe pirçekkirin, ji encama vê tezê tê ku her alî weke dijmin temaze dîke û wisa dizane ku cîhana derûdorê hertim li dij dewletê mijûlî pilandanê ye. Êdî bi kiryar dijminê diyar hebe an jî bi tenê di xeyala xwe de her kes û her alî ji xwe re dijmin dihesibîne, tiştekê naguhere.

Çiroka pêşbazî ji bo xwe teyarkirin di warê teknolojiya navikî de bi dijberiya navbera her du bilokên siyasî yê piştî şerê cihanî yê duyê, Amerîka û Sovyetê, dest pê kir. Her ev zêhniyet bû ku li pey re welatên din rakêşandin nava pêşbazîya berhevanîna çekên navikî.

Ceribandîna Koreyê, aştî û ewlehiya ku piştî sala 1953 li herêma çê bûbû, bi dijiyarîyê ciddî re rûbirû kir. Gumana vê hindê heye ku hem Japon û hem jî Koreya Başûr niha xwe neçar bibînin asta parastina xwe bilind bikin heya ji gefên cîhanê xwe yê nehecimî bînin parastin. Ev siyaseta dikare weke aleqeyek nû ji zincîra xwe pirçekkirin li herêma bikeve rojevê û dubare bi milyaran pereyê ku dikarî ji rahetiya jiyana xelkê re bê mesrefkirin, derbasî teknolojiya emrazên şer bike.

Welatên cîran û mezinhez ên cîhanê vê yekê napejirînin ku Koreya Bakûr bi siyaseta hevrezî li gel dewletên zêdegav di siyaseta herêma û cîhanî de bikeve pey şopek cuda ya siyasî. Çekên Koreyê îro li hemû deverên ku şer û tundûtûjî lê tên bikaranîn. Gumana hindê tê kirin ku teknolojiya navikî ya Koreyê jî bi heman şêweyê bikeve destê serxwazan û grûpên tundajî. Bi taybet siyaseta hevgirtî ya Kore ligel rêjimên weke Îran û Venezuela vê metirsiyê xurt dîke ku teknolojiya navikî ji kontrolê biçe der. Di rewşek wisa de dê hemû cîhan hertim di tîrsa hindê de be ku gelo kengê û li ku felaketa terorê dê pêşîra mirovayetiya bigre.

Ji bo Koreya Bakûr, dijminatîya îdeolojî bi

demokrasiyê û îdealên demokrasiyê re ji canê mirovan giringtir e. Di wan salên dawî de rêjîma Koreya Bakûr hem li asta herêma û hem li asta cîhanî bi tenê ji wan aliyan re hevpeymanî girê daye ku li dij pîvanên demokrasiya liberal (1) in. Mebest ji vê hevpeymanîya îdeolojîk bi tenê xurtkirina rêjim û rêxistinên tundajî û despotîk e ku heya niha jî amade nînin rê bidin tak û civak li gor şiyarî û berjewendiyên xwe biryarê bidin. Li Koreya Bakûr, piştî Kim Il Sung bi tenê Kim Jong Il, li Kûba piştî Fidel, Raol û li Îranê piştî Xumeynî bi tenê Xameneyî mafê biryardan bi ser qedê û dahatûya xelkê hene. Li gor wê dîtinê ger ev camêr nebin, hê civak û gel negihîştine vê astê ku berjewendiyên xwe nas bikin û bikarin bi xwe biryarê bidin.

Ev şêweya nêzîkbûnê ye ku îro Koreya Bakûr di warê siyasî û civakî de hê di salên destpêka sedsaliya 20'an hêştîye, di demekê de ku beşek din ji heman gelî li jêr siya sistemek hinek vekirî îro gehîştîye asta herî bilind a pêşketina abûrî û di warê siyasî de jî kêm maye bigehe asta demokrasiyê hevdem. Lê pirs ew e ku gelo çima ev cudayî? Ji ber çî du beşên yek welatî weha ji hev dûr in û pêşveçûna wan bi vî awayî ji hev dûr e? û di dawiyê de ev çî têgehîştin e ku rêjîma Kim Jong Il bi vî awayî daniye hember cîhanê?

Koreya hevgirtî heya destpêka sedsala 20'ê serbixwe nebû. Lê di serdema kolonyalîzmê de Japonê hemû Kore xiste bin kontrola xwe. Salên navbera 1910 heya 1945 hemû Kore weke beşek ji imperatoriya Japon dihatê temaşekirin, lê bi tevşikestina Japonê di Şerê Cihanî yê 2'ê de, rê ji bo serxwebûna Koreyê vebû. Wexta ku Japon ji Kore hate derxistin, welatê kete navbera du aliyan serkevtî yê şer ku di heman demê de ku bi hev re li hember Japon şer kiribûn, xwediyê du îdeolojiyên dijber bûn û her du amade bûn şerê nû yê li hemberî hev, ji her ku derfeta wan hebe dest pê bikin. Lewma hêzên Sovyet û Amerîka, Kore di navbera xwe de parve kirin. Piştî re ne Amerîka amade bû xwe ji herêma paşve bikêşe û hemû welat ji Sovyetê re bihêle û ne jî aliyê din amade bû camêriyek wisa li hember dijberê xwe yê îdeolojîk encam bide. Kore êdî bi awayek fermî sala 1948 hate perçekirin. Beşa Başûr bi piştgiriya Amerîka serxwebûna xwe ragehand. Di hember vê siyaseta de, Sovyetê jî beşa Bakûr weke welatek serbixwe ragehand.

Encama perçebûna ji bo xelkê Kore û rewşa welat bi karesat bû. Di salên navbera 1950-53 de her du beşên Kore ketne nava şerê hundir û di şerê sê salî de ku bi alîkarî û teknolojiya Amerîka û Sovyetê dihatê meşandin, bi kinayî 2,5- 3 miliyon kes hatin kuştin. Lê encamên civakî yê şer hê bi azartir bûn. Bi awayekê ku li encama dabeşkirina her du beşên welat de bi sedan hezar malbat ji hev hatin

veqetandin û îro nêzîk 6-7 milyon kes bi meroqin rojekê derfet hebe kes û karên xwe li aliyê din yê sînûran bibînin.

Li pêncî salên piştî agirbesa ku hê nebûye aştîya berdeyam, beşa Başûr ya Kore bi alîkariya Amerîka û bi siyaseta bazara azad gihîştê astek pirr bilind ya pêşketinê. Pêşveçûna abûriya Koreya Başûr di rêza 12 ya cîhanê de tê hejmartin. Di asta Asya de, Koreya Başûr xwediyê pileya 3. ya abûrî ye. Lê digel ku bi tenê 1/3 xelkê welat li Koreya Bakûr dijîn (Bak. 22 700 000, Baş. 48 500 000) û axa wê pirr ji ya aliyê din pitir e, rewşa abûriya beşa bakûr pirr felaket e.

Bingeha siyaseta abûriya rêjîma komonîstî ya Koreya Bakûr Kim Il Song li sala 1970 danî. Siyaseta ku wî jê re digot "juche" li ser bingeha *xwetêrkirinê* hatiye avakirin. Mebest ji vê pêngavê ev bû ku Koreya Bakûr bi xwe hemû hewcedariyên xwe berhem bîne û di warê abûrî de li ser piyê xwe bisekine. Lê encama birçîbûn û belengaziya heya ber stûyê bû. Heya wê dema ku Sovyet mabû, belengazî û bê îmkaniya xelkê Koreya Bakûr xuya nedikir, lê dema piştgiriya hêza Sor nema, "Kim"ê despot (serero) jî ma birçî.

Kurê wî Kim Jong-il ku piştî mirina bavê xwe li sala 1994 birêveberiya welat girte destê xwe, dîtina abûriya desthilatdar li welat neguhert û salên di navbera 1996-99 welat bi xelaiyê re rûbirû kir. Bi awayekê ku nêzîk heft sed hezar kes ji xelkê welat li ber birçîbûnê mirin.

Koreya birçî dikare ji bo bidestxistina pereyê pêwîst bo kirîna îmkânên here pêwîst, teknolojiya çekên navikî bide her kiryarê ku dirafê zêdetir bide.

Ji aliyê din ve hê rêjimên hevber ên Kim Jong Il hene ku amade bin hemû îmkân û hebûna welat û gelên xwe bixin xizmeta pêşvebirina teknolojiya xwe ya çekên navikî. Hema programa Ahmadî nijad ya çekên navikî bi serê xwe bes e ku bazara çekên Koreyê li herêma Rojhilata Navîn xweş bike û rê ji bo pêşbazîyê nû ya çekan veke.

Cîhana bi çekên navikî tu gav nikare cîhanek ewle be.

Lê metirsiya herî xurt wê demê ye ku çekên navikî bikevin destê rêjim û rêxistinên demargir û bê pîvan û prensîb. Cîhana îro bi tîra xwe ne aram û bi arîşe ye. Ji bo ku ev arîşe zemîneya xwînrijtî û kavîlkariyê xweş nekin, dibe ji zêdegaviyên Kim Jong Il re "NA" bê gotin.

(1): *Demokrasiya liberal ji liberalîzm weke îdeolojî û ji liberaldemokrasiyê cuda ye. Di demokrasiyên liberal de azadî û demokrasiyê weke du bingehên siyasî ne û mafê tak û kom tîne parastin.*

Mêrxasî û Berxwedana şerê sê roje li gundê Ceterê

“Gelî Hevalan ! Eger Hûn Çûn, Min Cî Nehêlin!”

Beşa 9 û dawî



Silêman Keleşî

Kek Silhedîn Mihîzade (Silho) xelkê gundê Bêrdûkê li devera Somayê ye. Kela Bêrdûkê Keleke gellek

qedîmî û dîrokî ye. Heta niha di gellek TV'yên Kurdî de bername li ser hatiye çêkirin. Silhedîn Pêşmergeyekî kevn ê PDKÎ ye ku di şerê gundê Ceterê de birîndar bû. Piştî ku birînen wî baş bûn, dîsan dest bi xizmet û xebata xwe di nava refên PDKÎ de kir. Piştî çend salan bi her awayekê be bera xwe de welatên derve û li welatê Australiyayê bû penaber. Rewşa wî niha gellek baş e, car û baran ez û ew bi telefonê bi hev re diaxivin.

Belê Silhedîn piştî demekê topbaran gundê Ceterê, lingê wî bi giranî birîndar dibe. Ew mecbûr dibe here malekê ku birîndar lê diman, heta ew jî bihê dermankirin. Lê mixabin ew îmkanên dermanî nebûn ku ew bi başî bê dermankirin. Eger dermankirin jî hebe, pirr destpêkî bû ku bo birîna Silhedîn û kesên dinê yê mîna wî gellek kêma bû. Lê navhatî bi her awayekê be heta şevê bi wê birîna giran û kûr û xwînêlêçûneke zaf sebir û tehemûl dibe. Lê ew tevahiya rojê çav bi rê bû ku heval bîn û birîna wî û hevalên bal wî derman bikin. Lê mixabin Silhedîn û hevalên wî nehatin dermankirin, belku ji destpêka birîndarbûnê heta girtina gund di bin wî şerê giran û topbarana qurs a dijmin de demjimêrî dikirin ka kangê dê gule top û katyûşa ji mala ku ew têde ne, bikeve û ew bêne kuştin. Silhedîn û hevalê bal wî tenê bi dengê çekan yan jî li serdana Pêşmergan dizanin ka şer kîderê ye û çî diqewime. Heta şev tarî dibe her di wê malê de dimînin. Lê tevî tarîbûna hewa û destpêka êrîşa dijmin bo nava gund, ew bi dengê agirbarana her du aliyan ku erd dihejiya, dizanin ku şer nêzikî wan bûye. Lê li wê demê ji ber tundiya şer û hatina hêzên dijmin bo nava gund kes seredana wan nake û wan jî hêz û taqeta rêçûnê nebûn. Her wê demê ku şerê giran dom dibe, jina xwediyê malê tê û dibêje wan ka hûn bo çareyekê li xwe nakin, ewa Pêşmergan gund bi cî hêlan û çûn, ewa dengê Pasdaran tê!

Çaxê ku birîndar wê xebera nexweş dibihîsin, birîndarî bîra wan diçe û dikevin bîra xwe derbazkirinê. Birîndar daxwaza alîkariyê ji wê xatûnê dikin, lê mixabin karekî wisa ji destê wê nahê û kesekî din jî nine ku alîkariya wan bike. Silhedîn ji wê xatûnê dixwaze ku darekê ji bo wî bîne heta bide ber xwe û ji malê derkeve. Jina malê daxwaza wî tîne cî û

darekê ji bo wî peyda dike ku bide ber xwe û li mal derkeve û nekeve destê dijmin, lêbelê sed minxabin du hevalên wî yên din bi navên **Silêman Reşîdî** û **Mizefer Kamran** ku ber birîndariya kur taqeta rêveçûnê nebun ketine destê dijmin her wê der gulebaran kirin.

Silhedîn darî werdigire û bi wê birîna kûr car car bi dar, car daran jî li ser dest û lepan û li ser berfê xwe li malê dûr dike, gellek daran jî bi dengê bilind gazî hevalan dike, ku min derbaz bikin. Ew gellek bi wê rewşa nexweş û xemgîn ser berfê dimîne û dest û pêyên wî heta qederekê sirê dibin, lê ew Pêşmerge qehreman bêhêvî nabe û her ber xwe dide, wek maran ser dest û singê xwe rê diçe û piştî demeke dirêj du heval lê peyda dibin. Ew heval jî ewane ne: **Cimşîd Kamiran** xelkê gundê Gêçê ku fermande û kadrekî jêhatî yê PDKÎ bû, ku di gundê Pîranciqê de bi destê caş û pasdaran hate girtin û piştî demekê ez yet û azarê bi destên rayedarên cîayetkar ên Komara Îslamî hate îdamkirin. Hevalê din jî **Ehmed Kurdnîjad** xelkê bakurê Kurdistanê bû. Ew jî li malbateke welatparêz bû ku di dema xwe de birayê wî ku şaredarê bajarekî Kurdistanê dibe, ji ber welatparêziya xwe bi destê hikumeta Turkiyê ve tê şehîdkirin. Kek Ehmed di nava PDKÎ de bû kadro û fermanderê hêz û paşan hate Ewropayê ku ez çî li çarenivîsa wî nizanîm. Kek Ehmed di Komîsyona siyasî -leşkerî, Komîta Serdeşt, Bane, Fêrgeh, melbenda "Şimal" û wd... xebitîbû) Ew her du hevalên han kek Silhedîn heta qederekî tînin û teslîmî çend xûşkên qehrem û parêzvanên roja tengavîyê dikin, ew çî îmkana hilgirtinê nabe, lewra birîndar dest û pê sirêbirî datîne nava Nasîrqê (bi farsî Firxon) û tînin bo gundê Mîrava û teslîmî hevalan dikin.

Birîndar zaf in, me 38 birîndar hene, Silhedîn yek ji wan birîndara ye ku rewşa wî gellk baş nine, nikare çî din ser berfê bijî, em nikarin bi wê rewş û halî herne gundan, em mecbûr in wî nava gel da cî bihêlin û weşêrin. Belê hevalan bi nejdil û nigeranî ve Kekê Silhedîn bi wê zirûfê nexweş ve teslîmî malekê kirin. Ew hevalê (Silho) ku bi çî fidakariyekê ku qelem nikare bas bike, xwe ji çengê dijmin derbaz kirî û gihîştîye hevçeperên xwe, dîsan diviya bi tenê bê hêlan û bi qeza û qedaran bê sipartin. Westê ku Silho wê qerara hevalan dizane ku ew divêt wî cî bihêlin, careke din kîrîrên li nav dil û hinavê wî tê. Lê çî ji destê kesî nayê, ew zirûfê qewimî ye û divêt tehmûl bike, her çend canê wî dikeve xeterê. Gellek xwîn li birîna wî çûye, ji

ber vê hindê rengê wî heta qasekê sipî û pît bibû. Pora serê wî ya zer gijûvij bû, bedena wî ya birîndar û sirêbirî mandî û kêma bizvîn bû, lê çav û guhê wî pirr hiûyar û qîşt bûn, ew dixwaze hemû tiştêkî di yek gavê (lehze)de bibîne û bibihîse, bîr û hizrên wî bi tevahî di cîyê xwe de ne, heta bîr û hizr û çavên wî gellek li daran kunckol bûne, heta bizane ku heval dê çî li wî bikin û dê çî bibêjin. Bi her awayekî be, ew bi wan dest û pê û birîna kûr, bi çav û bîra şiyar cî ma. Kekê Silhedîn piştî bicî manê wiha basa biserhatiya xwe dike û dibêje: "hevalan ez teslîmî malekê kirim, lê mixabin mirov ji ber barê emniyetî niha jî nikare navê wan kes û malan di vê nivîsarê de bas bike û wan hemû fidakariya xelkê şirove bike û têxe (rayêxin) ber çavê xwendevanên hêja. Belê heval çûn, dîsan ez tenê bê derman û bê heval mam, îdî hemû hêviya min bû xwediyê malê ka dê çawa min biparêze. Wê pêşka şevê ku mabûn heta sibê ji ber birîna û dest û pêyên sirêbirî û ji ber tîrsa hatina hêzên dijmin çavê min neketin serhev, li birîna min her xwîn dihat û pirr derd û jan hebû. Westê ku dinya ronahî bû û nebû, xwediyê malê hat û got: ewa pasdaran dewra gund girtine. Diyar bû ku xwediyê malê jî ji ber min her hişyar û nobedar bûye. Dema ku min ew xeber bihîst, bi rastî birîna min heta qasekê bîra min çû. Malxê malê ji bo parastina min cîyê mirîşka (kolane) bo veşartinê pêşniyarî min kir. Min çî qise û gotin nebû, wî çî digot, ya min her belê bu, malê ez bi wê rewşa ku min berê bo we bas kir, danîme cîyê mirîşkan û got: kanê çarenivîsa min û te dê bibe çî!?"

Piştî demekê ku ez li wî cihê teng, sar û tezi ku bêhneke nexweş jî lê dihat, cî bûm. Heta min xweş xweş nedikarî xwe têda rast bikim. Wê gavê bû ku dengê hêzên dagirkerên Kurdistanê, caş û pasdaran hate guhê min, ku li xwediyê malê û gundiyan dipirsîn ka Pêşmerge bo kîderê çûne û birîndarên xwe çî lê kirine. Xwediyê malê û gundiyan jî digote wan me çî haj Pêşmergan û birîndarên wan nine, başe çî qewimiye? hûn hikûmet in û divê hûn bizanin ka ew li kuderê ne, em feqîrên gund nizanin. Bi her awayekî be, piştî çend demjimêran pîrsîn û geriyane, gund bicî hêlan û çûn. Dema ku hêzên zordar bi yekcarî çûn, xwediyê malê hat û ez li wî cîyê nexweş derêxistim. Ez bo we çî bêjim û çî binivîsim li ser wan çend demjimêrên ku ez di wê çal yan qula reş û tarî de bûm, her kêma e...

Min wê gavê haj birîna xwe nemabû, hertim min fikra vê hindê fikir kanê kengê dijmin dê bêt û min ji wê cehnemê

derêxin. Car daran şerên roja derbazbûyî di bîr û hizra min re derbaz dibûn. Ez bi bihîstina her dengê diçûme dinyayêke dinê. Piştî demekê ku nehatin û ez peyda nekirim, heta qasekê ez bawer bûm ku îdî haj min ninin. Lê hindê xetera girtina min kêm dibû, bi wê qasê jî derd û janên birîn û dest û pêyên min zêde dibûn. Çiyê min nexweş û bedena min req bûye û ez nikarim xwe bibizivînim, ez bê taqetiyên ji xwe ve diçim, nikarim gazî û hawar û ofênê bikim. Min gellek carî di wê kunê de mirina xwe xwast. Ez nizanîm mirov û bîr û bawerî çî ye ku ew qas ber xwe dide û teslîm nabe? Gellek daran fikra min re derbaz dibû ku ezê qenc bim û careke din herme nava refên Pêşmergan û xebatê bikim. Rastî nizanîm ez çend daran ji xwe ve çûbim, demekê min zanî ku dengê xwediyê malê tê û li min nêzik dibe. Ew hat nêzik û halê min pirsî, lê halê çî, tenê bêhn tê û diçe û can dernakeve.

Ew malbata hêja û Kurdperwer cenazê min ji kullîna mirîşkan derxist û ez bîrm malê. Lê bedena min ji ber nelivînê hemû req bibû, hêdî hêdî ji ber germ û bizivînê wek tiştêkî qerisî vedibû.

Birîn û dest û piyên min her jan dikirin, kes nebû ku ji bo min çareyekê bike, xwediyê malê çî lê nedizanî ku alîkariya min bike ji bo dermankirinê Belê îro jî bi vî awayî bû, êvar em xatircem bûn ku îdî wextê hatina dijmin tewaw e, kêm û zêde ketina basa şer û berxwedana Pêşmergan.

Me digot baş bû ku îro tûşî şer nebûne. Hewa hêdî hêdî tarî dibû, di wî gund de elektrîk nebû, xatûnên malê çira anîn tijî neft kirin û piştê jî şûşê paqij kirin û çira hil kir û mal ronahî bû, her di wê gavê de deng hat, lê deng gellek bo min nasyar bû û min zanî ku ewa hevalên me ne.

Belê dema ku hatine jorê, kek Newroz Kadrê navça Somayê, Kek Şapûr Şucaî Kadr, Efedî serpel yan jî serdeste û çend hevalêkî din bûn. Heval birînên Silhedîn hindêkê dermanên seretayî lê didin û nan û çayê dixwon û divixon, gellek qedirdaniyê ji wê mala Kurdperwer dikin bona alîkariya wan.

Halê Silho di warê ruhî ve baştir bûye, lê rewşa wî ya birîn û sirêbirinê her wek xwe ye. Eger bixwazin gav bi gav jiyana wî di wan sê heftiyên de bas bikin, bi xwe dibe pirtûkek. Lê bi kurtî ew birîndara 20 heta 21 rojan di malan de bi nepenî ma, ji ber ku rêya derbazbûnê ji bo binkê sabit nebû, hemû rê ji aliyê dijmin ve dihatin kontrolkirin.

Silhedîn piştî wan 20-21 rojan ku diçe bo binkê sabit yê PDKÎ, ew bi xwe tenê nikare siwarê hesp be, lewra mecbûr dibe piştî kesekî din siwar be.

Dema ku ew her du dixwazin li ava çemê Dêrê derbaz bin, her du dikevne nava ava çem. Çaxê dikevin, Silhedîn hevalê xwe ber nade ku hem xwe xilas bike û hem jî Silhedîn, heta hevalê wî lê tûre û aciz dibe û dibêje: "ka min berde heta ez xwe û te xilas bikim".

Belê Silho wî ber dide û ew jî xwe û Silho xilas dike.

Ew hemû bûne av û nikarin ji ber dijmin jî agir hil bikin.

Ew heta direng di wê rewşê de dimînin heta xwe digehînin binkê Navenda "Şimala Kurdistanê" li gundê Dêrê.

Di dawiyê de, ez pîr bi dil sipasiya wan dost û hevalan dikim ku alîkariya min kirin bo serrastkirina vê rêzegotarê, ji wan:

Kek Kawûs Ezîzî bo wergerandin wê ji Kurmanciya Jorîn bo Soranî.

Kekê Azad Kurdî û Kekê Elî Munezemî bo serrastkirina Kurmancî.

Silhedîn Mihizade (Silho)



Kekê Cefer Hamidî û R. K û C. H li deverê bo şandina wêneyan.

Her wisa sipas ji bo wan rojname û malperên înternetî ku ew rêzegotare weşandin.

Mafê Mirovan



Nivîsîn: Peter R. Baehr
Wergeran: Mecîd Heqî

Rola Mafê Mirovan Di Siyaseta Dereve De

Bingeha Rojavayî (2)

Tu welatên endam ên Neteweyên Yekgirtî li dijî Carnameya Cîhanî ya Mafên Mirovan di sala 1948 de deng nedan. Heşt dewlet – Yekîtiya Soviyet û

pênc dewletên hevpeymanên Soviyetê digel Erebstana Seûdî û Afrîqaya Başûrî – xwe li dengdanê parastin. Yek ji hegerên ku Soviyetê xwe li dengdan bi Carnameya Cîhanî ya Mafên Mirovan parast, ewa bû ku ew Carnameya baleke kêma dabû bi giringiya ragirtina serweriya neteweyî. Nûnerê Soviyetê li Neteweyên Yekgirtî "Anrej Vişinskij" hizra serweriya mafên takekes li ser mafên dewletê red kir. Yekîtiya Soviyetê herwisa li ser wê bawerê bû ku diyarîkirina sînûrê serbestiya xwe derberrîne, diviya di destê dewletê de be û bo nimûne nabe rê bi weşandina hizrên faşîst û rasîst bê dan. Xwe parastina Seûdiyê li dengdan bi carnameyê bi wê hegerê bû ku ew welate li dijî serbestiya ol û dîn û mafê mirovan li guhartina dîne xwe bû. Mirovê/a musulman mafê guhartina dîne xwe tune.

Ji sala 1948 şûnde pîrensîpên Carnameya Mafê Mirovan gav bi gav bihêztir bûye, bo nimûne li konferansa mafê mirovan li Tehranê di 1968 û Vîyenayê li Hezîrana 1993'an, Dewletan xwe li Carnameya Mafên Mirovan dûr nexistîye.

Di welatan de bi kêmanî ew bi awayê devkî xwe girêdayî bi pîrensîpên carnameyê dizanin. Li Welatên ku bi devkî alîgiriye carnameyê dikin, wê yekê qebûl nakin ku di welatên wan de Carnameya Mafên Mirovan tê bînpêkirin. Standardên hatî nivîsî bi awayê teorîk hatine qebûlkirin, lê nek bi kiryar.

Şiroveya mafan di peymanên din ên mafên mirovan de

Giringiya Carnameya Mafê Mirovan hertim ji aliyê Rêxistinên ser bi Neteweyên Yekgirtî ve hatiye baskirin. Li peymannameya ku serxwebûna welat û dewletên kolonyal (1960) hatiye pesendkirin, li peymanên ji nav birina hemû cure çewisandinên li ser bingeha regezî (1965) û peymannameyên bêhejmar ên din yê Neteweyên Yekgirtî daxwaz li dewleta hatiye kirin ku Carnameya Cîhanî ya Mafên Mirovan berçav bigirin.

Di Biryarnameya sala 1968'an a Tehranê de hat pesendkirin, Carnameya Cîhanî ya Mafên Mirovan hevgehistina mirovatîyê zêde dike û bi vî awayî mafên nabe bê pêpeskirina mirovan tînan parastin û civaka navnetewî erkdar dibe bo mafên malbata mirovaniyê li seranserê cîhanê. Konferansa Cîhan a Duyem li ser mafê mirovan di sala 1993'an de, li Vîyenayê giraniyê dide wê yekê ku Carnameya Mafê Mirovan serekaniya îlham û bingeha hebûna Neteweyên Yekgirtî bûye li pêşvebirina standardên parastina mafên mirovan. Naveroka Carnameya Cîhanî roj bi roj zêdetir bûye beşek siruştî li yasayên navnetewî.

Encamên Propagandayê ji bo Komara Îslamî



Hesên Selîmî

Piştî anîn û birin û propagandayeyeke zaf ya ragihandin û sazî û dezgehên Komara Îslamî, serencam di nava wan 476 kesan de

ku ji bo hilbijartinên gerra dehem navnivîsî kiribûn, tenê selahiyeta çar kesan ji aliyê Konseya Parêzvan ya rejîma Komara Îslamî ve hatiye erêkirin û rê ji wan re hate dayîn weke berbijarên bi nav hilbijartinên Serkomariyê çalakiyan bimeşînin. Renge di pîrri cihên cîhanê de şert û merc û pîvan bi armanca nîşandana şaristanîyê û nezm û tekûziyê bihê berçavgirtin û ewa di rêya xizmet bi vîc û berjewendiyên ax û welat de be, lê hesaba Komara Îslamî ji piraniya welatan cuda ye. Bi lînihêrînek bi ser derbasbûyîya wan çar kesên ku selahiyeta wan ji aliyê Şêwra Nobedar ve hatiye erêkirin û her wiha çawaniya pêvajoya kesên ku selahiyeta wan hatiye redkirin, em dê pîtir bikarin vê sanogeriya hilbijartinan binirxînin.

Di nava wan 476 kesan de ku haziriya xwe berendambûnê hebûn, 42 jin dihatin dîtin, bi hatina van jinan bo meydanê û anîne berbasa pîrsa jinan li Îranê û zeqkirina her çiqas zêdetir a mafên jinan, li cem pîrri kesên xweşbawer ev gumane çê bû ku jin ji di çarçoveya sîstema Komara Îslamî de dikarin desthilata meşandina kar û baran li stû bigrin, Komara Îslamî ji bi awayekî zîrekane û bona ku rewşa han aloz û tevlihev nebe, pîrsa xwendineke cuda ji qanûna bîngêhîn ya Komara Îslamî anî holê. Wê yekê di kurt-dem de du qazanc ji bo Komara Îslamî a Îranê hebû, ji aliyekê rewş hêwir û aram ragirt û beşek ji keç û jinan bêdengî hilbijartin û ji aliyekî din ve jî hinek kes û girûpên savilke bi xwe re hevterîb kir, lê piştî listeya Konseya

Parêzvan û redkirina selahiyeta wan 42 kesan, naveroka rasteqîne a rejîmê bi bedewî û eşkere xuya bû û rûçikê dijî jinbûna qanûna bîngêhîn a wê rejîmê bi vîdeçûna niqaba çendîn salî ya xwe badan û dizîneve ji maf û azadiyên jinan – heke çî cara yekem jî nebû – rontir xwe derxist holê, careke din bangeşekerên dengdanê xiste şik û dudiliyê.

Pîrsa herî girîng û balkêş ku reng be beşeke zaf xwe jê gêl bikin, ewa ye ku çima tenê selahiyeta çar kesan hate erêkirin û ew çar kes kî ne?! Di nava 400 kesên din de ku ji aliyê Konseya Parêzvan a rejîma Îslamî a Îranê ve bi jêhatî û esleh nehatin zanîn û rê nehate dayîn ku xwe berbijar bikin, aliyê kê du kes bi navên Qasim Şulesedî û Ekber Elemî dihatin dîtin ku renge zêdetir ji wan çar kesan ku selahiyeta wan hatine erêkirin, ji bo man û qahîmkirina stûnên desthilata rejîma Melayan hewl nedabin, kêmtir nedane.

Van du kesane bi tejkirina forma amadebûn ji bo xweberbijarkirin û wajokirina wê, hebûna Wilayeta "Mutleqe" (reha) a Feqîh pejirandin û qanûna wê rejîmê jî cihê qebûla wan bû, serbarê vî halî jî, Konseya Parêzvan ji rehet û bereketa xwe bêpar kirin û derfeta han ji wan stand. Lewra niha bersiva wê pîrsê ron û zelal e ku li gora ramana Xamineyî û derdora wî - ku Şêwra Nobedar yek ji wan e – tenê û tenê ew çar kes dikarin herî zêde di xizmeta rejîmê û Wilayeta Feqîh de bibin, bi wateyê din, tenê çar kesên han xweyî bûn. Ew çar kes ku hemû îmkanat û dezgeheke rejîmê di xizmeta wan de ye, yekem kes **Mûsewî** ye ku piştî 20 salan bêdengiyê dil heye carek din vegere ser desthilatê û mîna wê dema ku Serok Wezîr bû, bikeve xizmeta rejîmê û serkut û qirikirina xelkê Îranê. Kesê

duyem, **Muhsin Rizayî**, Pasdarekî kevn û qedîmî yê Sipahê û siyasetvanê îro ye ku rûçikeke siyasiyane bi xwe ve digre. Ev kese di derbazbûyî de, di Sipaha Pasdaran de, baskê serkut û hêjmoniya rêberê olî yê rejîmê bû. Sêyemîn kes, **Mehdî Kerûbî**, serokê berê yê Meclîsa Şêwra Îslamî a Îranê bû, navhatî di serdemê Xatemî de ku bi dewrana Reformxwaziyê hatibû binavkirin, di kêleka Xamineyî de bû û bi kesekî gendel tê naskirin û navhatî yek ji wan kesane ye ku bi anîne rojeva hinek pîrsan, dilê hindek girûp, kes û aliyan bi xwe ve xweş kiriye ku dê bikaribe guhartin di sîstema Komara Îslamî de pêk bîne û pişt li derbazbûyîya xwe bike, bê hay ji vê çendê ku Kerûbî tu demekê nikare di çarçoveya rejîmê de bi qasê Xatemî xelkê li dora xwe kom bike, heta eger bikare wî karî jî bike, çavniherî nahê kirin bikare hêla sor a rêberê olî bibezîne. Belê kesê çarê, **Mehmûd Ehmedînejad** e ku renge tu kes neke înkara kar û kiryarên nerînî yên wî bike. Bi vê lînihêrîne em dikarin bibêjin ku di rastî de tu ferq û cudahiyeke di navbera van çar kesane de tune ye û li gor wan mana rejîmê û parastina desthilata Wilayeta Feqîh hêla wan a sor e. Ew qise û gotinên ku di propagandayan de tên kirin, tenê bona germkirina bazara dengdanê ye.

Ya ecêb û balkêş eva ye ku hindek girûp û kesên bi nav Opozîsyon ku xwe bi qurbaniyên siyasetê têkderane û dijî mirovî ya rejîma Îslamî a Îranê dizanin, yê bûne tirîbûna propagandaya germkirina wê bazarê, ew dixwazin bi navê xebata azadîxwazane a neteweyên Îranê ve tevî Komara Îslamî bikevine danûstanê. Lewra divêt ew bi başî bizanin ku ev pêla saxteçî demkurt e û piştgirêdan bi pêleke wiha saxte dê wan bixe beravê û xelkê Îran û Kurdistanê ji van xizmetkirina bi Komara Îslamî xweş nabe.

400 Mîlyon Birçî Di Cîhanê De

Li gor rapora UNICEF'ê, li Başûrê Asyayê di du salan de 100 mîlyon birçî zêde bûne û hejmara birçiyên gihîştîye 400 mîlyonî.

UNICEF'ê (Fonda Zarokan a Neteweyên Yekbûyî) li paytexta Hindistanê li Dehliya Nû raporeke bi navê "Li Başûrê Asyayê Bandora Qeyrana Aboriyê ya Jin û Zarokan" weşand.

Rapor li ser mîlyarek û 600 hezar kesên ku li Hindistan, Nepal, Srî Lanka, Bangladeş, Giravên Maldîv, Butan, Pakistan û Afxanistanê dijî, disekine.

Li gor raporê qeyrana aboriyê di du salên dawî de bandoreke gellek xirab li van 8 welatan kiriye û hejmara kesên birçî ji 300 mîlyonî derketiye 400 mîlyonî.

Berpîrsê Asyaya Başûr yê UNICEF'ê Daniel Toole ku ev rapor pêşkêşî çapemeniyê kir da zanîn ku herî zêde jin û zarokan tesîr ji vê qeyranê girtiye.

Wekî notek: Li gor daneyên Bankeya Cîhanê, li Asyaya Başûr mîlyarek û 18 mîlyon kes rojane bi du dolarî kêmtir pereyî dijîn. Tenê 455-620 mîlyon kesên li Hindistanê (serjimariya Hindistanê 1.17 mîlyar e) rojane bi 1,25-1,35 dolarî dijîn.

Çavkanî: Diyarname



Xeteriyên Tundûtûjiya Pêkhatayî Li ser Jinên kurd û Îranî



Arif nadirî

Tundûtûjî alav yan şîwazek tê hesibandin ku bi bikaranîna wê, kesek yan hejmarek ji kesan pê tèn tirsandin

û ji aliyê kes yan kesên din ve tèn kontrolkirin.

Tundûtûjiya han ku armanc û mebesta taybetî a xwe dimeşîne û bi terzekî sistematîk û bi awayekî berdewam yan ji bo heyameke demdirêj tê birêvebirin, tundûtûjiya herî pêşkevtî û organîzbûyî ye ku bi tundûtûjiya pêkhatayî tê nasîn.

1. Tundûtûjiya fizîkî an cendekî
2. Tundûtûjiya pîskolojîkî
3. Tundûtûjiya zayendî
4. Tundûtûjiya devkî

Lê tundûtûjiya pêkhatayî ku zêdetir di welatên Îslamî de ku qanûnên wan li gor rêbazên Olî hatine darêtin û yasayên welatên han berheqbûna xwe ji olan distînin, tundûtûjiya herî naskirî û nav û deng e. Tundûtûjiya ne tenê di nava civakê de hatiye cîgirkirin, belku bi eşkere di nava qanûnan de jî reng vedaye û ji aliyê dewletê ve tê piştevanîkirin. Bi gotinek din tundûtûjiya han ji sîstem û pêkhataya desthilatdariya zal bi ser civakê re ji dayîk bûye.

Di konvansiyona Rêxistina Neteweyên Yekbûyî de, ji bo qedexekirina tudûtûjiyê li dijî jinan hatiye: "Her gavek ku bibe asteng li hember gihîştina jinan bi derfetên



wekhev ên qanûnî di warên aborî, siyasî û civakî di civakê de, weke tundûtûjiyî tê hesibandin.

Helbet her çend ku tundûtûjiya li dijî jinan yê bûye diyarde û pirsgirêkek cihanî û li gor ragihadina saziya Tundurustiya Cihanî di her 18 çirkeyan de jinek di cihanê de berbirûyê liv û tevgerên xirab û nexweş ên tundûtûjiyê dibe, lê pirsgirêka heyî di nav wan welatan de ku xwediyê desthilata olî ne, eva ye ku sîstem her bi xwe afirîner û berhembhînerê dab û edet û kevneşopên tepeserkirin û tundûtûjiyê ne. Bo mînak di Komara Îslamî a Îranê de çendîn madeyên taybet ên weke: madeyên 220, 630, 105, 208, û 226 ên qanûna Cezayên Îslamî û madeya 23 a gelaleya piştevanîkirin ji malbatê, rê ji bo piraktîzekirina tundûtûjiyê di nava malbat û civakê de xweş kirine, bi terzekê ku niha %70 ji malbatên Îranê bi awayên rojane tundûtûjiya malbatî diceribînin.

Sîstema desthilatdar bi ser welatê Îranî de, qanûnên xwe li ser bingeha newekheviya jin û mêr, ferq û cudahiya zayendî ava kiriye û ji rêya pejirandina qanûna ferq û cudahiye û darêtina siyasatên mîrserdest, pêşî ji pêkhatina her cure guhartinek çandî û giştî girtiye.

Rejîma Îranê ji rêya bihêzkirina bavserdestî û mîrserdestiyê, qazanc û mana xwe ji hebûn di nava dîtin û ramanên paremayî de dizane û delîve

û bestênên hewce jêre amade dike.

Jin di Îran û Kurdistanê de berbirûyê tundûtûjiyê çend qatî dibin, ji aliyekê ve jin weke mêran berbirûyê tepeserkirinê dibin û ji aliyekî din ve jî weke jin, ger kurd jî be, eva jî bi xwe sûç, hêcet û sedemek din e bona tepeserkirina wan.

Yanî jin ji sê aliyan ve anku deb û adet, civak û desthilatê ve bi terzek sistematîk berbirûyê gefan dibin û mafê wan yên mirovî seba xwendina hişk û selefîyane ji ol û pejirandin û cîbicîkirina qanûna nedadperwerane û parastina dab û edetên paremayî, tèn bînpêkirin û wek mirovekî xwedî maf û xwedî bîr û biryar nahên mîzekirin.


Heta di warên tûşbûn bi madeyên sirker, fehşa (laşfêroşî) û nexweşiya "AIDS" jî ku civaka me ji dest wan dinale, jin goriyên sereke ên diyarde û xesarên han in.

Ji aliyekê din ve, Îran ne amade ye "konvansiyona betalkirina her cure ferq û cudahiyeke li dijî jinan" ku di roja 18'ê Çileyê Pêşîn a sala 1979'an de di kombûna giştî a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî de hate pesendkirin, wajo bike. Çimku li gor esla 4 a qanûna bingeîn a Komara Îslamî, gişt qanûn û rêsayek divêt tevî rêbazên olî, bigunce. Lewra rastî eva ye ku dema ku çavkaniya darêtina qanûn û bingeên biryardana, xwe girêdayî bi dîtin û rayên melayen desthilatdar bi ser Îranê bizanin, tu guhartinek erênî di civakê de pêk nahê.



ŞARISTANIYA HEMDEM

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Bi guherîna rewşa pergala cîhanê ya nû re ramyariya gerdûnê dikeve kirasekî din û rewşa cîhanê dirûveki nû digire. Dixuye ku ji îro pê de, dê li şûna şer û pevçûnên aborî, bîrdozî û ramyarî, têkoşînên çandî û zanyarî rû bidin û welatên dinê bidin bin bandora xwe. Her çend ku ev yek wekî bayekî hênîk bête dîtin û pêşî li xweşiya mirovan biçe jî berê vê çûyînê ne li xêrê ye. Çimkî ev yek jî bi destê desthilatdariya dinê pêk tê û mirovahî bê hemdê xwe arasteyî tengaviyên nû dibe. Jixwe ne pêkan e ku neyar û neqencên dinê rabin ji bo mirovatîyê tişteki xêrdar û sûdewar bikin.

Îro, desthilatdariya dinê ji ber alavên şer ên kujende û teknolojîk – ên ku qira wan jî tîne- dixwazin heta demekê, şerê germ bidin rawestandî. Ne ji bo xatirê mirovahiyê, wekî her car ji bo sûd û berjewendiyên xwe, ji dêvla şerê germ, şerê sar ango çanda impyeralîst didin destpêkirin. Îcar divê baş bê zanîn ku şerê sar her gav ji şerê germ tirsnahtir, xeternaktir û diwartir e. Çimkî cîhana gelan û welatê dinê her car di dema şerê sar de tê/hatiye dabeşkirin, parçekirin û parvekirin. Dîrok şanî me dide ku şerê cîhanê yê yekemîn û duyemîn piştî şerê sar dest pê kiriye û peyre jî cîhan ji aliyê çend hêzên serdest û mêtînger ve hatiye parvekirin û talankirin. Îro mebest û armanca serdest û mêtîngerên dinê, parçekirin û parvekirina gelan û welatê wan e. Her çend ku reng, dirûv, nav û nîjada împyeralîstan bête guhartin jî kar û kirinên wan tucar nayên guhartin.

Sedest û zoranên dinê, baş dizanin ku îmro bi alavên şer û lêdanên bêteşe tu kes nikare bigihîje armanca xwe. Ji bo wê ye ku ew jî bi pey konevaniyên nû ketine. Tiryak û nexweşiyên nû dadihênin. Û dîsa wekî her car êş û nexweşiyên nû yên bê êş û jan raselîtî ser serê mirovahiyê dikin û tevê mêjiyê mirovatîyê bi van tiryak û nexweşiyên bezmdar pûç dikin û ditevizînin. Yanî desthilatdariya dinê îro hewcetiyê bi şerê germ nabîne. Çimkî baş dizane ku komkomîkirina mirovan a bi çand û şaristaniyên nû, her gav ji ramyariyên aborî, leşkerî û bîrdozî asantir û watedartir e.

Gava ku behsa şaristaniyê tê kirin, pêşî çand û dîroka kevnar û şaristaniya gelan tê bîra mirov.

Şaristanî, hebûneke çandî û mirovî ye.

Gund û bajar, nîjad û ol, civak û neteweyên dîrokî hemû pûxtiyên şaristaniyê ne. Veguhêztina şaristaniyên kevnar, girêdayî rabirdûya çanda mirovahiyê dirûvên nû digire. Îro her berhemeke dîrokî, nîjad û civakeke kevnar bi bîra mirov dixê. Bêguman ev yek di dahatûya mirovahiyê de jî roleke pir girîng û dîyarker dileyze. Hebûna civak û nîjadên dîrokî, girêdayî şaristaniyên kevnar e. Şaristaniya hemdem a îroyîn li ser rîknê çanda şaristaniyên kevnar û qedîm ava bûye. Alavên teknolojîyê û geşepêdaniya zanyariyên civakî, hem pevkeliyandina çanda kevnar û nûjen û hem jî şaristaniya hevpar û hemdem a îroyîn pêk aniyê. Bi kurtayî şaristaniya îroyîn, bi pevkeliyandina şeş-heft şaristaniyên cîhanê yên kevnar û nûjen re li nasaveke nû dadigere. Ev şaristaniyên kevnar û nûjen hin jê ev in: Şaristaniya Rojava, Şaristaniya Japonî, Şaristaniya Hindê, Şaristaniya Îslamê, Şaristaniya Slavan, Şaristaniya Emerîkaya Latîn, Şaristaniya Misrê, Şaristaniya Mezopotmayayê û Şaristaniya Efrîkayê.

Cudayetiyan navbera şaristaniyan tucar naşibin cudayetiyan navbera bîrdoz, pergala û ramyariyên civakî. He çend ku di demên borî de şer û pevçûnên giran her gav ji ber van cudayetiyan derketibin jî, dîsa nayê wê wateyê ku dê ev cudayetiyan, her gav bibin sedema şer û pevçûnên navbera şaristaniyan. Na ! Dibe ku îro têvê şaristaniyan, belê her yek ji wan bi reng û cureyên xwe hev û din xurtir û dewlemendtir jî bikin. Jixwe divê ku wisa be. Lewre pêdiviya mirovahiyê îro bi vê yekê heye.

Û divê şaristaniyên kevna û nû li sentezeke erênî dagerin û her şaristanî wekî robareke jînê biherike ser deryaya aşî, azadî û mirovahiya cîhanê.

Ger ku cîhan û gerdûn geşedaniyên xwe yên xwezayî bidest bixin, dê têkûzbûn û kemilîn jî bibe para mirovahiyê.

Dibe ku di pêşerojê de jî têkoşîna navbera van şaristaniyan bidome. Belê heke bi vî awayî bidome, dê cîhana hemdem û mirovahiya navser bi lêkdana navbera van şaristaniyan re li şaristaniyê nû ya hevpar bihesile. Ango wê şaristaniyên kevna jî nikaribin taybetî û reseniyan xwe yên dîrokî biparêzin.

Kaniya Helbestan

Çîrokên Evîndariya Derewîn



Cankurd

Di tariya şevê de
Ez tîrêjên roya bi tîn bi bîr
tîn
Di nêv kêlên goristanê re diçim
û xew SIYASÎ
na jîneke bê dawî dibînim...
Li bêşeya bê dar û bê av
Ez kûr û dûr û fireh dinêrim
Ji seravê...
Ji nistina herheyî pê ve tişteke
nîne...
Û ji nişka ve...
ez li gundê xwe yê mîna behîştê
vedigerim...
Ji „Kanîsarkê“, di pença xwe de,
avê vedixum,
Di ser „Benda Romanî“ re
dibezim,
ku dike xumxum û nalenal
û tozava wê li rûyê min dide...
Li ser zinarên germik ên
„Golzuqaqê“
Ez guhdariya „Aşê mezin“ dikim,
ku di çavikên xwe re
bi hembêzan ava wekî berfê sipî
davêje...
Û li ser pireya piçûk,
a ku bi lehiyê re çûye...
Ez hîn çavrêya wê pêjnê dikim,
ku mîna guleke Cûrî
li baxê Îrem bo bilbilan
çîrokên evîndariya xwe ya
derewîn dibêje...

Bîranînek ji wan tiliyên ku huner jê dibarî

N: Loqman Ebdulazade
W: Rondik

Huner, çand û kultur hin peyv in ku ji bo her gel û neteweyekê

tê wateya nasnameyê û bi hîmê bingehîn yê wê netewê tê hesabandin. Lê di rastî de wateya eslî û rastîn ya wan peyvên çîye?

Ger em wan bi zimanek sade û xomane pêname bikin, em dikarin bibêjin ku heman metoda jiyana, livîn, riftar, û kar û kiryarên rojane yên me ne. Mirov divê bîr ji hemû ew tiştan bike ku bi awayek xwestî û nexwestî hatine nav proseya jiyane. Divê mirov biçe nav kûrahiya hizr û bawer û bihayên mirovî û netewî, heya ku jêre eşkere bibe ku huner û kultura bav û bapîran çawa hetanî vir hatiye. Çûnku çand û hunera her neteweyê û girûpekê, xwedîka wê neteweyê û girûpê ye. Eva jî nahê înkarkirin ku huner çeka herî girîng û bibandor e li xebata rizgarîxwaziya gelên bindest bi giştî û gelê mafxwarî yê kurd jî bitaybetî. Ji bo me kurdan bi tu awayekê xebat û berxwedana hunerî û kulturî a netewî jî xebat û tekoşîna siyasî nahê cudakirin bi taybetî di qonaxa niha de.

Kê nînin ew şoreşvanên kurd ku bi biçûktirîn alav, mezintirîn xebat û berxwedanî meşandine. Yek ji van kelleme û şoreşvanên kolneder, mamosta "Qale Mere"yê bilûrvan bû. Diyare her neteweyek ku xwediyê serbestî û hikûmeta netewî a xwe nebe, hunermendên rastîn yên wê jî tu car jiyane xweş bi xwe re nabînin û wekî Hêmin dibêje aware, derbider û biêş û azar in. Qale Mere jî yek ji wan hunermendên netewî û bêpar ji xweşiyên jiyane bû.

Qadir Ebdulazade, naskirî bi Qale Mere, 80 salan berî niha li gundê "Kolîce" ser bi bajarê Mehabadê ji malbatek dilpak û hejar de hate dinê. Herwek bi xwe gellek caran bas kiriye ku jiyane pirr ji derd û êş û azar



hebûye. Bavê xwe nedîtiye û mixabin her di jiyê 6 saliyê de jî diya xwe ji dest dide û ji vê neimeta mezin jî bêpar dimîne.

Hunermend Qale Mere her wekî bi xwe jî gotiye: "Ew her bi malbat hogirê bilûrê bûne û bilûrvanên mezin jî di nava wan de hilketîne. Hunermend Qale Mere her li temenê zarokatiya xwe hogirê bilûrê bûye û dest û tiliyên wî bi bilûrê firçik girtine. Ew dibêje gellek caran di demên derbiderî û mişextbûnê de hevderdî û hevxiyamiya koma xebatkarên salên 46- 47'ê kiriye û pirr caran jî tevî Hejar û Hêmin hevnişênî kiriye. Hunermendê nemir bi sedema awareyî, derbiderî û janên jiyane, pir direng jiyane hevpar pêk aniye. Ew sala 1364'ê Rojî di bajarê Bokanê de jiyane hevpar pêk tîne ku berhema vê jiyane wî, du xortin bi navên Mihemed û Ehmed in.

Mirov dikare bibêje ku parek ji taybetmendiyên hunerî a Qale Mere eva bû ku bêy mamosta anku bi awayek xoristî hîni vê hunerê bû û birastî jî bi bilûra xwe berhemên mezin afirandiye, û pirr car jî di nav park û li ser şeqaman de bo êminkirina mela xwe û şadkirina dilê neteweyê û

bîranîna rojên tal û şirîn, destê xwe dibire ber şûtika xwe û bilûra xwe derdixist û bi penceyên zêrîn yên xwe bilûr dixiste semayê. Pirr caran xelkê kombûyî li dewra hev, diçûne nav bîr û hizrên xebat û berxwedana bilûra mame Qale. (Îşare bi Radyo Dengê Kurdistanê Îranê)

Mame Qale pirr caran gotiye ku temenê bilûra wî 150 salî bûye û tenê bi xwe 30 salan bi vê bilûrê xizmeta gelê xwe kiriye.

Dengê bisoz yê bilûra Qale Mere, xêncî wê ku di nav dilê xelkê Kurdistanê de pêgeha taybetî a xwe heye, herweha gellek ji xelkê cîhanê jî bi dengê bilûra Qale Mere hevnas in.

Qale Mere ji bilî xelata rêz û hezkirina gelê kurd bi giştî û hogirên hunera kurd bi taybetî, çendî xelatên deverî û cîhanî jî wergirtine.

- Xelata baştirîn bilûrvan – welatê Alman ku mixabin nehiştin biçe werbigere.

- Xelata taybet bi Enfalê di sala 2003'an de li bajarê Silêmaniyê.

- Xelata xelkê bajarê Bokanê di sala 2003'ê û çendî xelatên curbicir yên din di hundirê Îran û Kurdistanê de. Qale Mere berî wê ku hunermend be, mirovek siyasî, xebatkar û nîştimanparêzekî kurd bû, hez û hêvî û kiryarên jiyane wî, tewawkerê xebata hunerî – siyasî a wî hunermendê mezin bû. Mixabin qedere, felek û mirinê izin neda ku bi hêvî û xweziyên xwe ku çeqandina ala Kurdistanê û rizgariya neteweyê wî bû, bigihîje. Mixabin roja pêncşem, 31.02.1388'ê Rojî bo yekcarî xatira yekcarî ji gel û nîştiman kir û roja îne 01.03.1388'ê Rojî termê wî di nav koma xelkê bi emeg yê Kurdistanê de li bajarê Bokanê û di biniya çiyayê "Naleşikên"ê de û li rex gora hunermendê nemir, Hesên Zîrek, teslîmê xaka pak ya Kurdistanê hat kirin.

Ji Çiya Mazî Pirtûkeke Nû: “Mijarên Mîqro”


Çiya Mazî bi Zyemîn pirtûka xwe a çirokan derket pêşberî xwendevanan. Wekî tê zanîn

Çiya Mazî pêşî pirtûka çirokan “Mistek jiyân” weşandibû. Dûre bi pirtûka “Palûte” a helbestan dom kiribû. Herwiha Mazî, bi lêkolînên folklorîk û zargotinî û wergerê jî tê nasîn. Pirtûka wî ya bi navê “Fehenga Gotinên pêşyan” di sala 2005 an de hatibû weşandin. Ev fereheng li Duhokê bi tîpên Erebi (kurmançî) jî di 2006’an de hatibû weşandin. Herwiha gellek nivîsarên wî jî di gellek weşanan de hatine weşandin.

“Mijarên Mîqro”, nişana guherîna çirokên Çiya Mazî ji alî teknîk û şewazê xûya dike. Di çirokên xwe de bi piranî li ser pisîkolojiya mirovan sekiniye. Tiştên biçûk ku mirov lê heyirî dimînin an mirov bi wan tiştan dikevin astengiyên mezin û nikarin derkevin bi piranî bûne mijara çirokên Mazî. Minak; kêzikek, xewna zarokekî, çeqmaq, dibistan û fikandina mirovekî bûne mijara çirokên wî.

Ya herî girîng ku di vê pirtûkê de xuya dibe, tiştên bêgiyan ku dipeyîvîn an dibin lehengê çirokan wekî; kevîr, dar, mêw. “Dara bihîvê” û “Dara Mêwê”; van darana her yek ji xwe re çirokek mîrovan ji xwendevanan re vedibêjin. Van çirokana rewşa civakê bi awayekî hêsan derdixin pêşberî xwendevanan.

Di “Dara Bihîvê” de em li rastî kuştina jin û qîzan rast tînin û bi mînakên tewl bitewl. Di vê çirokê de jin û mêr li derekê rûdinin û planên kuştina qîza xwe dikin. Lê wekî



guftûgoyên ji rêzê diyalog rêz dibin. Mekanê vê çirokê welatê Kurdistanê ye. Bajarek e, lê ew bajar bi navê hemû bajarên Kurdistanê tê binavkirin. Wekî dibêje; “em li paş bajarekî dirokî rûniştine, gelo Diyarbekir e, gelo Mêrdîn e, Riha ye, Xerpût e? Na na, ez dibêim Êlih e yan jî Agirî. Dibe ku Hewlêr an Duhok be jî, nizamim. Weke navê Mehabad jî tê guhê min, belkî nav ew be jî.” Ev nişandayîna kuştina jinan ku li herderê welatê Kurdistanê belabûyî derdixê holê”.

Di çiroka “Şemo Şano” de hînbûna şkençeyê ku mirov êdî demek te şkençeyê bi tiştêkî nahesibîne xuya dike. Herwiha carinan mirov dibin wekî wahş û hirçan û bêrehm dimînin di çiroka “Şahîdî” de. Lehengê çiroka

balkêş “Dîmen xweş e” bi navê “Brêz M.” zixtan li pîroziya dayikê dixê û dibêje “ez ji diya xwe hez nakim”. Herwiha di çiroka “Niqrîskên Gewriyê” de jî dayik tê rexnekirin.

Di çiroka finalê “Xewna Dawî” de lehengê çirokan giş tînin bibîranîn, vê çirokê bi xewneke dawî ya pir balkêş cîhekî xweş girtiye di pirtûkê de. “Tenûra mala şêx”, “Em” “Ma ev jî nig in”, “Kekê mino zava” “Dînamo” çirokên din yê balkêş in di pirtûkê de.

Wekî çirokên kurdî ku van salên dawiyê derdikevin, di çirokên Çiya Mazî de jî pêşketina wêjeya kurdî xuya dibe û tahmeke xweş ya ziman bi mirov didin tahmkirin. “MÎJARÊN MÎQRO” di weşanxaneyê “do” yê de hatiye çapkirin.

Navenda Nêrgiz’ê Bi Boneya Roja Cîhanî a Zarokan, Şahiyek LidarXist

Roja duşem, 1’ê Hezîrana 2009’an, bi hinceta Roja Cîhanî a Zarokan, di hola giştî a binkeya Deftera

Siyasî a PDKÎ de, şahiyek mezin ji aliyê Navenda Nêrgiz’ê ve hate lidarxistin.

Nûçegihaniya Kurdistanê de jî derbarê de ragihand ku zarokên kempên PDKÎ û navend û rêxistinên taybet bi zarokan li çend bajarên Herêma Kurdistanê, bi vê hincetê di şahiya han de beşdar bibûn.

Di destpêka şahiyê de peyama Deftera Siyasî a PDKÎ, ji aliyê Mihemednezîf Qadirî ve hate xwendin. Piştê zarokên Navenda Nêrgiz’ê, sirûda “Cîhana Zarokan” pêşkêş kirin.

şahî bi awayê jêr birêve çû:

- Aryako Rehîmî, peyama Navenda



Nêrgiz’ê pêşkêş kir.

- Rêxistina Behremend ji bo hişyariya zarokan, çend dîlan pêşkêş kirin.

- Zarokên Navenda 1 a Kurdistanê,

şanoyek birêve birin.

- Gurûpa sirûda Navenda Nêrgiz’ê sirûda “Esman” pêşkêş kirin.

- Zarokên Başûrê Kurdistanê, sirûda “Roja Şahiyê” pêşkêş kirin.

- Tîma Werzişî a zarokên Navenda 3 a Kurdistanê, çend hunerên werzişî nişan dan.

- Strana “Rap” ji aliyê zarokên Hewêrê ve hate pêşkêşkirin. Di dawiya şahiyê de zarokên kempa Azadiyê, şanoyekî

komedî birêve birin. Hêjayî gotinê ye ku di şahiya Roja Cîhanî a Zarokan de, xelat bi ser beşdaran re hatin belavkirin.

Bilûrvanê Navdar Yê Kurd Qale Mere, Koça Dawiyê Kir



Bilûrvanê navdar yê Kurd, Qadir Ebdulazade, naskirî bi Qale Mere, şeva pêncşem, 21'ê Gulana 2009'an, di nexweşxaneyê giştî a bajarê Bokanê de çû ser dilovaniya xwe.

Qale Mere mirovek welatperwer û xweşteviyê xelkê Kurdistanê û her wiha destekî wefadar yê şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo bû. Ji ber ramanên xwe yê welatparêzî çend caran kete girtîgehê.

Qale Mere nêzîk 80 salan, bi rêya bilûrê, hez û evîndariya xwe bi nîştîmanê nîşan da û folklorê Kurdî zindî ragirt û zengîn kir.

Koça dawî a hunermendê navdar Qale Mere, kul û kovaneke mezin xiste nav dilê xelkê Kurdistanê. Di çend bajarên Kurdistanê Îranê de, hunermend Qale Mere bi civîn, semînar û rê û resmên taybet hate bibîranîn. Dengê bilûra wî dê herdem wî di nav dilê hemû hunerkezek kurd zindî bike...

Bo Yekemîn Car Jinek Bû Seroka Parlamantoya Hindistanê

Nûnerên Parlamantoya Hindistanê, bi tevahya dangan roja çarşem, 3'ê Hezîrana 2009'an, jinek weke Seroka Parlamantoya wî welatî hilbijartin.

Mîra Kumar ya 64 salî dîplomatek serkevtî ya Hindistanê bûye û 5 gerran jî endama Parlamentoyê bûye. Eva cara yekemîn e ku di Hindistanê de jinek dibe seroka Parlamantoya



wî welatî. Mîra Kumar ji sala 1985'an şûnde tevî siyasetê bûye.

Herêma Kurdistanê Şandina Neftê Bo Derve Dest Pê Kir



Roja 1'ê Hezîrana 2009'an, ji bo kurdan serkevtinek girîng û dîrokî hete tomarkirin, niha pê re bi awayekî fermî petrola Herêma Kurdistanê dê bi rêya boriyên nefta Îraqê ên navbera Kerkûk û Ceyhanê derbasî welatên Ewropayê bibe.

Li gor agahiyan, ji vê petrolê dê %17 bikeve destê Kurdan. Serokê Herêma Kurdistanê, Mesûd Barzanî ew roj weke rojê dîrokî û gavek girîng nixrand.

Şirketên ku di seneta petrola Kurdistanê de dixebitin, dê rojane heta 90 hezar bermîlan nefta Kurdistanê bişînin derve. Hikûmeta Herêma Kurdistanê hêvîdar e ku heta sala 2010'an, şandina nefta Kurdistanê di rojê de bigihîje 250 hezar bermîlan.

Ev çend sal bû, eva xala cihê nîqaş û pirsgirêkên navberê Hikûmeta Herêma Kurdistanê û dewleta navendî a Îraqê bû.

Dûkela Cigarê Xetera Tûşbûna Mirov Bi Nexweşiya Şekirê Zêde Dike

Kêşana cigareyan û dûkela cigarê xetera tûşbûna mirov bi nexweşiya şekirê (diabet) çend qatan zêde dike.

Li gor lêkolînên nû yê di vê derbarê de, ciwan û jin herî zêde dikevin ber vê xeterê, lewra daxwaz tê kirin ku di cihên giştî de cigare nehên kişandin.

Bijîşkên vê warê dibêjin ku



nexweşiya şekirê çendî nexweşiya cur bi cur bi xwe re tîne û kêşana cigareyan xetera tûşbûn bi vê nexweşiyê 6 qatan zêde dike.